


Çalakvanên Almanî:
Em Ewropayeke bê
teror dixwazin

»»» R:7



Pîroz be Roja
Cîhanî a Zimanê
Dayîkê

»»» R:4



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (392) 20-02-2021 Buha (1000) Tûmen

Pêla nû a girtin û
tepeseriya Rojhilatê
Kurdistanê

»»» R:5



Qedera
Kurdan

»»» R:8



Saleke din û jiyanêke taltir

Aborînasên Îranê
dibêjin: Pîvera
çarereşîya xelkê di
Îranê de gihîştîye %70
ji î, û rohn nîne ku
deştildar dixwazin wê
meşê heta kîderê bi-
domînin.

Ew dibêjin: Da-
mezraveyên çavdêrî
gendeliyan vedişêrin
û her eva jî bûye
rêxweşkerek bo
pêkanîna wê krîzê.
Di Hawîna îsal de
piştî bilindbûna nirxa
bêkarî û enflasyon li
Îranê, pîvera çarereşî
giha bi %45 ji î ku eva
jî pêka sala derbasbûyî
du hembere zêdetir bû.

Ew amaranê nîşan
didin ku rewşa xelkê
Îranê roj li pey rojê xi-
rabtir dibe û çarereşî,
hejarî, betalî û enfla-
syon ew xistîne tanga-
hiyan.

Pêka pîvera cîhanî
ya çarereşî, “Venezu-
ela” pêka rêjeya 79/4
pileya yekem, Îran
bi rêjeya 61/6 pileya
duyem û “Serbia” bi
rêjeya 44/8 pileya
sêyem di rêzbenda wê
pîverê de ne.

Pêka wê pîverê, her
yek ji wan welatane
Japon, Qeter, Alman û
Amerîka di rêzbendên
baştirîn welatên cîhan
de ne ku enflasyona
aboriya wan gelek

kêm e û betalî di nizimtirin asta xwe de ye.

Hin welatên wekî Fîlîstîn, Turkiya û Pakistan tevî hebûna şer û nearamî û dorpeçên aborî li ser welatê wan, pîvera çarereşîya wan di asteke baş de ye.

Pîvera çarereşî pêka gelempera nirxa enflasyon û nirxa betalî tê diyarîkirin.
Nûçeyek amara nû ya aborî eşkere dike û bas ji vê yekê dike ku nivînciya geşeya aborî li heyama sala 1398an heta 1399an a Rojî, %6 ji nerênî bûye û aboriya Îran di heyama sê salên derbasbûyî de berde-
wam digel rawestandîne rû bi rû bûye.

Yek ji rojnameyên aborî yên Îranê jî basa vê yekê dike ku Îran di rewşa asayî ya aborî de, bo vê ku



bikare li rewşa rawestansdina enflasyona niha derbas bibe, şeş sal dem hewce ye, eva jî bo vê ku bê ser
rewşa sala 1390`an a Rojî.

Herwisa di sala derbasbûyî de aboriya Îranê %20 ji piçûk bûye û pêka danînaverhev a geşeya aboriya
Îranê heta dawîya sala 1399`an a Rojî, bi li berçavgirtina dahata nefta wê, di navbera nerêniya 5 heta
%7 ji û bi bê neft di navbera nerêniya 2 heta %3 ji dibe.

Ji aliyek din ve jî, amara şeş meh a qebareya danûstandina bazirganiya Îranê hatiye belavkirin û pêka
wê amarê, Îran raştî kêmbûna bazirganiyê hatiye.

Pêka dawî raporên meydanî, dema ku xelk bo kirîna xanî yan jî bi kirêgirtina xaniyan serdana bingra-
han dikan, digel nirxa zêde ya xaniyan rû bi rû dibin.

Eva jî di demekê de ye ku pêka gotina yek ji berpîrsên kedkarî di Îranê de, nivînciya xercê jiyanê her
malbateke kedkarî di Îranê de zêdetir ji 8 milyon û 700 hezar Tumen di mehekê de ye û eva jî di halekê
de ye ku dahat wan kêmek zêdetir ji 1/3 xercê wan qerebû dike.

Sergotar

Mûşekên beredayî

N: Kerîm Perwîzî

Di roja cîhanî a Hez-kirinê de ku evîndaran gul pêşkêşê yektir dikirin, hêzên terorîstî yên ser bi Spaha Quds a Komara Îslamî, Hewlêr û balafîrxane û çend taxeke wî bajarî bi mûşekan kirin bi armanc.

Rakêten teqiyayî yên hêzên ser bi Spaha Quds, kuştina kesekê û birîndarbûna çend kesekê li pey xwe anî û ziyanekê kêmkirî jî gihand balafîrxane û çend cihên Hewlêrê, lê ya ku ji ziyana maddî û canî zêdetir bû, eva ye ku ewlehî û asayîşa paytexta Herêma Kurdistanê kir bi armanc û nigeraniyek di nav xelkê de çê kir.

Belkî pêka edebiyata daxuyaniya wê girûpa ku teqîna mûşekan girte stuyê xwe, armanca wan huşdarîdan bi Amerîka û desthilata Herêma Kurdistanê be û wisa bide xuya ku Amerîka û hikûmeta Herêmê kirine armanc û dixawzin teslîmê daxwazên terorîstan bin, lê kiryarên wiha yên girûpên ser bi Komara Îslamî, qet aliyê hember neku netirsandîye, belkî bûye sedemek ku bertekên rêxiravtir û tundtir li pey xwe bîne û destûpêyê rejîmê pê girêbide.

Ew rakêtan ku terorîstan bi maşîneke destekarîkirî li xwarê Hewlêrê ber bi paytexta Herêmê ve teqandin, rege ji warê armanca leşkerî ve hewil dabin gelek seraştî cihê wê pêka lêkolînên hûr bikin bi armanc, lê di siyasîyê xwe de gelek bi hûrî bo wê neçûbûn û bêserûberiya wan wisa kir ku rege serê fermandeyên wan bide ba.

Kiryara terorîstî ya roja

Mîstefa Hicrî: Bi hebûna kesên weke Zarayê, civatgeha Rojhilatê bûye dibistaneke mezin û berfireh bo hînbûna zimanê Kurdî



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta roja cîhanî ya Zimanê Dayîkê peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

Komara Îslamî, xwendin bi zimanê Kurdî di dibistana Kurdistanê de qedexa dike û hewla he-landina wê dide, lê me tirsek nîne. Bi hebûna kesên weke Zarayê, civatgeha Rojhilatê bûye dibistaneke mezin û berfireh bo hînbûna zimanê Kurdî.

Roja 21`ê “February”ê, roja cîhanî ya Zimanê Dayîkê li tev netewa Kurd û mamosteyên emekdar û zarokên hişyara û dersxwanên çavekirî û dibistana mezin ya Kurdayetî pîroz be.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

2`ê Reşeme ya 1399`an a Rojî

20`ê Şibata 2021`an

14`ê “February”, ji teqîna ter

orîstî ya 1`ê “February”ê ya çendîn sal berî niha ya bajarê Hewlêrê diçû, herçiqas mixabin canê çendîn kesan dike qurbanî, lê qet negihaye bi armanca xwe ku xwaştibe aliyê qurbanî bitirsîne û teslîmê daxawzê terorîstan bike.

Di dema niha de Komara Îslamî ew rakêtan bo ceribandina îradeya îdareya “Biden” û çavtirsandina hikûmeta Herêmê teqandin, lê wekî piraniya lêkolînên din ên rejîmê, ew kiryarane zêdetir cîhanê tîne ser wê baweriyê ku nabe rê bi terorîzma Îslamî ya Tehranê û barimtegîriya wê rejîmê bidin.

Herwek hewla terorîstiya Esedullah Esediyê wan li Alman û Biljîkê, bi tewawî bi ziyana rejîmê şikeştîye, kiryara terorîstî ya şeva 14`ê “February”ê li bajarê Hewlêrê, ne destkefta wê bo rejîma Komara Îslamî nabe, belkî hem Amerîka li ser piştevanîkirin bi Herêma Kurdistanê pêdagirtir dike û hem jî rohntir bi hemû aliyekê îsbat dike ku dujminê sereke yê hemû gelên deverê û nemaze dujminê rasteqîne yê Kurd û Kurdistan, rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye.

Ew rejîme çavkaniya fitne û terorîzîm li deverê û cîhanê ye û bo gihîştin bi aşî, dibe dawî bi çavkaniya wan rakêten beredayî bê, ku her roj ji qiraxekê ve ber bi qiraxeke din a deverê ve tîne teqandin. Kurdistan dimîne û Komara Îslamî diçe nav zibldana dirokê.

Navenda Hevkarî derheq kiryara terorîstî ya li ser bajarê Hewlêrê daxuyaniyek belav kir

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê di daxuyaniyekê de belav kiriye: “Ji dîtingeha me ve, vê carê jî destê reş yê tawana Komara Îslamî ya Îranê di wê kiryara terorîstî de eşkere ye û hemû dizanin ku Komara Îslamî ya Îranê ye bi handan û dana çek û mifahwergirtin ji girûpên terorîstî yên deverê, dujminê bingehîn yê aramî û cihgîrbûna asayîşê di Rojhilata Navîn de ye”.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Daxuyaniya Naven-
da Hevkarî bi hilkefta
mûşekbarana bajarê Hewlêrê

Hevnîştimaniyên bi rêz!

Her wekî hûn agehdar in ku li şeva 2021-02-15an, 14 mûşek ber bi aliyê hewlêr û balafirxaneyê ve hatine avêtin û çend taxên wî bajari bûne armanca wan mûşekan; Mixabin di encama wê kiryara terorîstî de, kesek bû qurbanî û 8 kesên din jî birîndar bûn; Bikerên wê kiryara terorîstî ji aliyê her girûp û



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران

Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.

مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

dewletekê ve be, em bi tundî şermezar dikin.

Herwisa em daxwazê ji aliyên pêwendîdar li Îraq û hevpeymaniya navdewletî ya li dijî terorîzm û Serokatiya Herêma Kurdistanê dikin ku, bi micidî li pey wê kiryara terorîstî bikevin û terorîst û bikerên wê kiryara terorîstî bi raya giştî bidin nasandin û wan bigihînin bi cezayên xwe.

Ji dîtingeha me ve, vê carê jî destê reş yê tawana Komara Îslamî ya Îranê di wê kiryara terorîstî de eşkere ye û hemû dizanin ku Komara Îslamî ya Îranê ye bi handan û dana çek û mifahwergirtin ji girûpên terorîstî yên deverê, dujminê bingehîn yê aramî û cihgîrbûna asayîşê di Rojhilata Navîn de ye.

Xuya ye ku eva cara yekê nîne ku Herêma Kurdistanê raştî êrîşa terorîstî hatiye û dibe armanca neyarên wê Herêmê û cara dawiyê jî nabe.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdsitana Îranê wê kiryara terorîstî bi tundî şermezar dike û daxwaza leşsaxiyê bo birîndarên wê bûyerê dixwaze.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdsitana Îranê

28`ê Rêbenadana 1399`an a Rojî

16`ê Şibata 2021`an

Peyama rêzdar Mîstefa Hicrî bi hilkefta koça dawî ya Dr. Roj Nûrî Şaweys

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta koça dawî ya Dr. “Roj Nûrî Şaweys” Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) peyameke hevxemiyê belav kir.



Deqa peyamê wiha ye:

Rêzdar/ Mesûd Barzanî Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê

Tevî silav û rêz,

Nûçeya koça dawîya xwedêjêrazî Dr. “Roj Nûrî Şaweys” kadirê bikêrhatî û rêberayetiya PDK û Endamê Mekteba Siyasî ya wê Partiyê, cihê xem û nerhetiye me hemû aliyên e.

Ez bi vê hilkeftê ji aliyê rêberayetiya “PDKÎ” ve sersaxiyê û hevxemiyê pêşkeşê we û endamên rêberayetiya “PDK” û hemû endamên malbata xwedêjêrazî dikin û em xwe hevparê xema we dizanin.

Rêz û hurmeta dûbare

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

27ê Rêbendana 1399an a Rojî

15ê Şibata 2021an

Pîroz be Roja Cîhanî a Zimanê Dayîkê



N: Nûredîn Sofizade

Dîroka diyarîkirina roja Zimanê dayîkê di sala 1999'an de weke roja cîhanî ya Zimanê Dayîkê ji aliyê "UNESCO"yê ve hat pejirandin.

Mirov dikare bêje ku ziman, yek ji sitûnên nasnama mirova ne. Herwisa ziman, belga herî berçav a hebûna raştiya mirov û pêşketina mirova ne. Zimanê dayîkê, ev ziman e ku zarok ji dayîk û bavê xwe hîn û fêr dibin. Ev yek li gor lêkolînên zaniştî jî hatiye pejirandin. Zimanê dayîkê, zimanê ku mirov ji dayîk û bavê xwe hîn dibe.

Zimanê Kurdan ê dayîkî zimanê Kurdî ye.

Ji sedsala 20'an ve, zimanê dayîkê bi zimanê fermî hatiye bicihkirin. Wata wê jî, ew bû ku zimanê deshilat û rejîma serdest di her welatekê de kîjan zima bû, ew ziman tenê wekî zimanê fermî û xwendin û nivîsînê bihatiba naskirin û dibe zimanê perwerdehiyê.

Herçiqas Ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve rojek bo bîranîn û pîrozkirina zimanê dayîkê hatiye diyarîkirin, "roja 21'ê Şibatê" weke roja cîhanî ya "Zimanê Dayîkê" ye, lê diyarîkirina rojekê weke roja Zimanê Dayîkê, nekariye hêşta di hemî cîhanê de cih bigre. Rejîmên hakim di piraniya welatan de hêşta ew raştiye qebûl nekirine ku tenê zimanê rejîma serdest, zimanê fermî nîne û divê rêz û mafê ku bo zimanê dayîkê di "UN"ê de hatiye pejirandin, bo wan zimanên cuda ji zimanê xwe, berçav bigrin. Dema ku zimanê dayîkê hatiye pênasekirin, ku bi wateya nasname û bingeha naskirina heçî neteweyekê

ye, bê guman divê her neteweyek, zarokên ku zimanekê ji dayîka xwe hîn dibin, pê biaxivin û ew ziman bibe zimanê perwerdehiya wan jî. Bo mînak netewa Kurd û axa wan Kurdistan ku mixabin niha bi ser 4 welatan de hatiye perçekirin, li Kurdistanê zimanê Kurdî zimanê Dayîkê ye û her Kurdek bi wî zimanî diaxivin, lê di Kurdistanê de zimanê dayîkê ji aliyê rejîmên serdest yên wekî deshilatên rejîmên Îran, Tîrkiye, Îraq û Sûriyê ve hatiye qedexekirin.

Di wan welatên ku Kurd û Kurdistan bi ser de hatiye parvekirin, zimanê fermî, zimanê Farsî, Tirkî, Erebî ye ku ew jî zimanê netewên serdest e.

Zimanê Kurdî ji aliyê deshilatên wan welatan ve bi fermî nehatiye naskirin, û perwerdehiya zimanê Kurdî ji bilî Îraqê qedexe ye.

Li wan 4 welatên ku Kurdistan bi ser wan de hatiye perçekirin, dehan netewe û itnîk ku her yek ji wan bi zimanê dayîkiya xwe diaxivin, ji bilî zimanên Farsî, Tirkî û Erebî çî yek ji wan zimanan fermî nayê naskirin û perwerdehiya bi wan zimanan qedexe ye.

Di Kurdistanê de netewa Kurd, zêdebarî hemî qedexeyî yên ser zimanê Kurdî, bi hebûna siyaseta helandin û jinavbirina zimanê Kurdî

ji aliyê rejîmên deshilatdar ve, lê gelê Kurd li pêxema paraştin û dewlemendkirina zimanê xwe de xebat kiriye û bedelên mezin dane û nehêlane ji nav biçe.

Zimanê Kurdî li Kurdistanê naha bûye zimanê çand û wêjeyê, û berdewam pê hatiye axivtin, nivîsîn, strîn, û bûye zimanê mediayî û rojnamevanî û roj bi rojê tête dewlemendkirin û dijminan nekarîne di siyaseta xwe ya asîmîlasyonê de bi dijî zimanê Kurdî serkevin.

Êdî dirûşma "Zimanê Me Nasnama Me Ye" cem hemî Kurdan bûye dirûşmekî wate-dar û her Kurdek xwe erkdar dizane bona parasina nasnama xwe ku zimanê wan e. Qedexeyiya li ser zimanê me ji aliyê deshilatên dagîrker ve, nekariye berahîka xebatkarên xemxwar ên Kurd bigre ku berdewam cehd kirine bona pêşxistina zimanê Kurdî û cehdekî bê mînak kirine ku çanda bi Kurdî binivîse û bixwîne, bi Kurdî biaxive û ji nasnama xwe xwedî derkeve, di nava hemî gelê me de cih bigre.

Di demekê de ku li cîhanê, heta niha bi hezaran ziman ji nav çûne û nemane, lê gelê me di bin hemî zext û givaşan de zimanê xwe parastîye.

Mirov dikare bi piştgirêdana dîrokê û belge û çavkaniyan bêje, ku zimanê Kurdî, zimanê herî kevn ê devera Rojhilata Navîn e, lê bi he-

gera dagîrkariya Kurdistanê û nebûna dewlet û kiyaneke Kurdî ku Kurd qedera xwe bi deşt ve bigrin, zimanê Kurdî renga li astê cîhanê de bi fermî nehatibe naskirin, lê mirov dikare bêje zimanê Kurdî yek ji zimanên herî zindî û dewlemend e û di serdemê nû de jî roj bi rojê geşe dike.

Mixabin fermiyet û rewayetî niha li ser zimanan di du-nyayê de, girêdayî dewlet netewe ye.

Gelê Kurd ne tenê di roja diyarîkirî a Zimanê Dayîkê de, rêzê ji wê rojê digre û pîroz dike, belkî Kurd di kit kitê rojên salê de divê ji zimanê xwe xwedî derkevin û kar li ser dewlemendiya zimanê xwe bikin.

Di dawiyê de roja cîhanî ya Zimanê Dayîkê li hemî wan gel û netewane pîroz be ku şerê man û paraştina zimanê xwe dikin.

Herwisa roja cîhanî a Zimanê Dayîkê li hemî gelê Kurd pîroz be û hîvîdar im paraştin û dewlemendkirina zimanê xwe bi erkê netewiye xwe bizanin, bi wê hêviyê ku rojekê zimanê Kurdî li jêr deshilatên dewleta Kurdistanê de bibe yek ji zimanên fermî ên cîhanê.

Bila ew dirûşa ji bîra ti kurdekê neçe ku:

"Zimanê Me Nasnama Me ye"

INTERNATIONAL
MOTHER
LANGUAGE
DAY
21
FEB



Pêla nû a destbiserkirin û tepeseriya Rojhilatê Kurdistanê!



N: Dara Natiq

Di heyamê borî de û nemaze di nîveya heyva Befranbara îsal de heya niha herî kêm 100 çalakvan û hevvelatiyên Rojhilatê Kurdistanê bi sedemên siyasî û ewlehî ji aliyê rejîma dagîrker a Îranê ve hatine desteserkirin. Pêka raporek ku Ajansa Nûçegihaniya Mafê Mirov a “Kurdpa”yê belav kiriye, Ji rêkevta 17ê Befranbarê heta niha, pêlek ji binçavkirin û gazîkirina welatiyên Kurd li bajarên, Mihabad, Merîwan, Rebet, Sine, Bikaner, Sewlawa, Nexede, Pîranşehr, Urmiye, Seqiz, Kirmaşan û Tehranê ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîma Îranê ve dest pê kiriye ku hegera wê heye dîsan her berdewam be. Di vî heyamî were heya niha ji aliyê hêzên emnî kempenyeyeke girtina çalakvan û xwendekarên zanîngehê yên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi sedemên ciyawaz hatiye destpêkirin û kesên desteserkirî “li girtîgehên nihênî yên li Urmiye û Sine tîr ragirtin.

Li gor amarên ku Ji aliyê saziyên mafê mirov ve hatinî belavkirin li Rojhilatê Kurdistanê sala 2019an nêzikî 2 hezar kes û sala 2020an jî nêzikî 400 kes bi tohmêtên “peywendîya bi hêzên Kurdistanî, çalakî û karê rêxistinî” ji aliyên hêzên Îranê ve hatine desteserkirin. Herwisan di destpêka sala 2021`an de heya niha jî zêdeyî 100 havwelatiyên Kurd li çendîn bajarên kurdistanê hatine binçavkirin û rapêçî girtîgehan hatinekirin û di bin îşkence û hikmên girtîgeha dirêjheyam û îdam bi ser wan de hatiye sepanandin. Li gor agahiyên hatine belavkirin, çalakvanên



hatine desteserkirin nekarîne parêzeran ji xwe re bigrin û beşeke wan a zêde bêtî agahdarkirina malbatê hatine desteserkirin.

Pêvajoya tepeserikirin û girtin û kuştin û qirkirina xelkê Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê rejîma dagîrker a Komara Îslamî û damûdezgehên wê yên emniyetî û serbazî ve, roj li pey rojê bi micid û xortir dibe. Rejîma Îranê cuda ji siyaseta bîrsîkirin û bi talanbirina heyî û samana binerd a Kurdistanê û guherîna demografiya wê herêmê, bi awayek berdewam û bi hêncetên ewlehî, civatgeha Kurdistanê bi giştî û xurtên Kurdistanê bi taybetî hevrişî girtin û zîndan û eşkence û darvekirinê dikan.

Rayedarên rejîmê hertim bi çavek emniyetî mîzeyî Kurdistanê dikan û xelkê wê herêmê jî weke şaromendê derece du dibîne û lewma navendên emniyetî û serbazî yên rejîmê maşîna xwe a tepeserî û qirkirina civatgeha Rojhilatê Kurdistanê hertim û bi awayek şidet û berdewam dimeşînin. Rejîma Îslamî a Îranê di heyamê zêdetir ji çar dehiş ji deshilatdariya xwe û bêtî guhdan bi yasa û rêsayên navneteweyî û li pêş çavê raya giştî a cîhanê li tinekirina Kurdan berdewam e û roj li pey roj xurtên Kurdistanê dibin goriyê siyaseta mirovkujane ya wê rejîmê.

Hemû mafên huqûqî û si-

yasî yên Kurdan di qanûna bîgehîn de sistematîk û bi bernamê hatin binpêkirin û qedexekirin, Kurdistan heta niha jî be, piştî zêdetir ji 40 salan ji deshîlata rejîma axûndî, paşketîrîn û bîpartîrîn herêma Îranê ye, sermayedanî li Kurdistanê di asta herî nizim de ye an qet nine, ew rêjeya biçûk a sermayedanî jî ku heye, ya keda xelkê bi xwe ye.

Piştî zêdetir ji 40 salan bi ser temenê wê rejîmê, hêştî bi sedan hezaran kedkar û kasibkarên Kurd li Îranê, ji ber bîkariyê, kasibkariyê dikan û jiyana xwe dixin xetera hêzên çekdar ên Îranê, bo peydakirina pariyeke nan bo malbata xwe. Rojane dehan kasibkar li ser sînoran bi teqeya hêzên Îranê tîr kuştin û birîndarkirin. Di warê kultûrî de jî, ziman û bîgehên nasnameya Kurdî qedexekirî ne, hemû hewla rejîmê asîmîlekirin û helandina Kurdan di nav ziman û çanda Farsî de bûye.


Tepeseriya sistematîk a derheqê Kurdan her di destpêka bitalanbirina şoreşa azadîxwazî a gelê Îranê ji aliyê rejîma dagîrker a Xumeynî û hevbiş û hizrên wî ve, berdewam e û bûye beşek ji jiyana xelkê belengaz yê Rojhilatê Kurdistanê.

Netewa Kurd li Îranê ji mafên herî destpêkî yê xwe bêpar in û heya îro jî çî pênasîn bi mafê kultûrî, civakî, aborî û ramyarî ne-

hatiye kirin û hertim hevrişî asîmîlasiyona çandî û guherîna demografiyê bûye. Her daxwazek biçûk û berheq ji bo mafê qanûnîya Kurdan bi binçavkirinê, eşkence, zîndanê û dardakirinê tê bersivdan. Êdî rejîmê rêya wegeriyane nemaye û stêrka bextê wê hêdî hêdî ber bi avabûnê ve diçe. gel êdî biryara xwe daye û çî din naxwazin di bin siya wê rejîma han de jiyanek rezîlane û bi kul û keser derbas bikin. Di pêşerojek nêzik de emê car din şahidê meş û serhildanên seranserî yê nerazîbûna xelkê bin, bo ji holê rakirina kela zordariyê di Îranê de.

Pêla nû a destbiserkirina çalakvan û xebatkarên Rojhilatê Kurdistanê jî wedigere ser çalakbûna bizava azadîxwaz û rizgarîxwaza Kurdistanê û tîrsa rejîmê ji hişyariya siyasî û neteweyî a xelkê Kurdistanê. Rejîm dixwaze bi tepeserikirina xelkê Kurdistanê tîrs û xofekî di nava xelkê de çê bike û herwisan pêş bi şîpela nerezayetiya xelkê li rejîmê bigre. Lê eva zêdeyî çar dehkan e ku rejîm berdewam hewla fetisandin û bîdengkirina xelkê mafxwaz yê Kurdistanê dide û nekariyê wî dengê mafxwaz û azadîxwaz bifetisîne. Dengê azadîxwazî û mafxwaziya xelkê Kurdistanê û îradeya berxwedan û rawestan li hember zîlm û zoriya dagîrkarî a rejîma Tehranê roj li pey rojê berdewam û bilindtir dibe.

Vê jehrê, vê carê dê kê vebixwe



N: Serbest Urmîye

Bercam yan lihevhatina li dor bernameyên navikî yên rejîma Îranê ye, ku ji sala 2015'an ve heya îro jî ti encameke erênî bo civaka cîhanê jê peyda nebûye. Ne kariye ku destê rejîma Îranê di aloziyên herêmî û cîhanî de qut bike û ne jî kariye rejîma Îranê ji domandina bernameya xwe ya navikî, bî merema gihîştin bi çekên navikî, bisekinîne. Ya ku heya niha ji encama Bercamê hatiye dîtin, valahî yan derfetek bû ku di heyamê sê salan de û di rojên herî teng û nazik de kete destê rejîma Îranê ku bikare heya qasekê (ne ew qas jî zêde) rewşa xwe ya ji berhevderketî ya aborî bi ser hev de bîne. Lê di rastî de bi serhevdehatina rewşa han jî derfeteke din da destê rejîmê ku pişka debara şer ya hevalbendên xwe yên eniya şer û terorê, dabîn bike û aloziyên pitir bîne rojevê.

Wê demê jî serbarê nerazîbûna beşeke herî zêde û heya qasekê jî rêberê rejîmê ji naveroka û rûniştina ser maseya danûsitandinê bi şeytanê mezin wate Amerîkayê re, lê rewşa Îranê nemaze di qada aborî de, cama jehrê bi rêber û karbideştên rejîmê re da vexwarin. Lê jiber ku merema rejîmê ji wê derfetê geşekirina welat û bihêzkirina tîkiliyên saxlem bi cîhan û herêmê re nebû, ne dest ji şerajoyiya herêmî hilgirt û ne jî xwe bi naveroka lihevhatina han ve girêda. Bi terzekê ku dewleta Tiramp di sala 2018'an de, bi derketina Amerîkayê ji wê lihevhatinê, carek din hemû hewila xwe da ku rejîma Îranê vegehe ser rewşa berê ku bikare di bin zext û givaşê de destê şerxwaziya Îranê ji cîhanê lawaz bike.

Di vê meydanê de ya bûyî û ya nebûyî berçav e, lê ya ku îro taybet bi rejîma Îranê ketiye rojeva dest bi karbûna dewleta nû bi serokatiya "Joe Biden" di Amerîkayê de, cardin tendûra Bercamê gerim kiriye û dibe ku careke din cama vê jehrê bîne ser maseyê, îcar ka kê dê vê carê vexwet.

Di vê derheqê de, rejîma Îranê li gor ezmûnên xwe, dewleta "Joe Biden" dom yan qonaxeke nû ya dewleta "Obama"yê ya Partiya Demokrat dihesibîne û hewil dide ku car din di her du seran de vê lîstikê bibe.

Ya rast derheq rejîma Îranê û piştî nemana Bercamê, xêncî krîzên siyasî û mehkûmbûna rejîmê di qada mafên mirovan de û çendîn kiriyarên terorîstî weke mînak herî berçav, xistin û kuştina hemû rêwîngên balafira Okraniyayî, dûbare wegeriyana krîzên aborî li ser rejîmê û him jî hatina nexweşiya Koronayê, bi terzeke eşkere rejîm him di qada siyasî û diplomasiyê de bê hitbar kiriye û him jî di qada aborî de barê jiyanê li ser milê welaiyên Îranê bi qaseke zedê giran kiriye. Bi terzekê ku rejîm daniye ser duriyanekê ku divê yan careke din jehra xwe vexwet, yan dawiya temen bibîne. Heke rejîma Îranê rejîmeke yasa pesend û gelhez be, di her du seran de jî dibe bigihîje xeta dawiyê. Jiber ku vexwarina jehrê û wegeriyana Bercamê di demekê de ye ku em dizanin di navenda yasadanîna rejîmê wate (Meclisa Şorayê Îsalamî) de derketina rejîmê ji Bercamê û domandina meyndina uraniyomê, bû yasa û ji aliyê "Şorayê Nigehban" ve jî hate pesendkirin.

Eva tê vê wateyê ku heke rêya paşdeçûnê bê hîlbijartin, rejîm him dê ber bi rûyê demûdezgehên nerazî yên xwe bibe û him jî dê pêgeha xwe ya gelî ji dest bide. Ew yeka jî di welatên demokratîk de, wate hiloşandina desthilatê.



Aliyê din yê vê pevajojê, endamê din ên Bercamê, wate dewletên Ewropayî û Amerika ne. di vê derheqê de ya ku heya niha hatiye dîtin hewlesta endamên Ewropayî ji berê tundtir bûye û heya niha bi caran haydarî dayîne rejîma Îranê, lê serê xetê û beştevira sereke di dest Amerîkayê de ye û çareserîya vê pîrsgirêkê girêdayî bi hatin yan nehatina Amerîkayê ye bo careke din ser maseya danûsitandinan.

Dewleta nû ya Amerîkayê bi serokatiya "Joe Biden" di vê derheqê de li hember du lêgeran de tê dîtin. Yekem hevpeymanê wê yên siyasî, stratejî, aborî û ... yên dijberî rejîma Îranê ne. Duhem rejîm û civaka Îranê. Di lêgera yekemîn de û li gor hizra karnasên siyasî yên Amerîkî û heya hin berbîjêrên "Joe Biden" bo îdarekirina hikûmeta nû, ji bo wegeriyana bo Bercamê, "Joe Biden" dibe ku bihayeke giran a siyasî bide. Bihaya siyasî jî ev girêdidin bi nerazîbûn yan jidestdana hevalbendan, nemaze hevalbendên herêmî û piranî jî tekezê li ser Îsraîlê dîkin. Him weke hevalbendê bihêz yê Amerîkayê di Rojhilata Navîn de û him jî weke welateke xwedî bandor li ser civaka Amerîkayê. Renge bihayeke wiha hind bi hesanî nehê dayîn. Yan jî heke bê dayîn, renga wateya vexwarina jehrê bo "Joe Biden" be. Jiber ku ev bawer in ku di çi rewşekê de Amerîka amade nine Îsraîlê ji destê xwe bide û îşare bi vê hindê

jî dîkin ku di heman demê ku dewleta "Obama" kete nava Bercamê ya lihevhatinê tevî Îranê, di heman demê de jî dest ji Îsraîlê berneda û çend rojan piştê kereştayên pêşkevî yên mûşekî şandin wî welatî.

Ya duyem rejîm û civaka Îranê ne ku mirov dikare bêje herdu weke kartên li dijî hev tên bikaranîn. Wate hewil tê dayîn ku bi vekirina hin rêyan û li lîstin bi demê re, bi berdewambûna krîzan rejîmê pitir bixin ber zextan û heke bikarin heya qasekê destê wê di pîştivanî û dabînkirina debara şer a hevalbendên wê yên şerxwaz de kurt bikin û him jî bi giranbûna barê jiyanê li ser milê xelkê Îranê, rejîmê ber bi rûyê hêza gel ve bikin û bi berfirehbûna meşê û serhildanên nerazîbûnên seranserî li dijî rejîmê, yan rejîmê neçar bikin ku weke rejîma berê dev ji welat berde û bireve, yan bikeve bin barê xwestekên cîhanî de.

Ji aliyeke din ve jî serbarê vê hindê ku derketin û wengeriyan bo Bercamê û meyndina uraniyomê li Îranê de ji aliye nûnerên gel ve bûye yasa û hatiye pesendkirin, hewil tê dayîn ku bi wegerandina rejîma Îranê bo Bercamê bi awayeke din hitbara rejîmê him di nava xelkê Îranê de û him jî ji aliye dezgeh û aliye nerazî yên hundirê rejîmê ve bibin bin pirsîyarê û bi vi awayî serbarê vê hindê ku jehrê bi rejîmê re didine vewxarin, rejîmê ber bi aloziyên hudîrîn ve bibin û lawaz bikin.

Nerîna Lîderan



“Joe Biden”:

“Em bona danûstandinan digel Tehranê amade ne, û hevdem em ê dawî bi kiryarên alozker ên rejîma Îranê di deverê de jî bînin”.



“Benjamin Netanyahu”:

“Her kes metirsiyê li ser me diruşt bike, em ê dê hember rawestî, bo mînak Îraneke navikî”.



“Jen Psaki”:

“Tehrîmên li ser Îranê dê berde-wam bin”.



“Eli Xameneyî”:

“Hekî Amerîka derheq rêkvevtina Bercamê hewlê bide, em ê jî dê hewlê bidin”.

Çalakvanên Almanî: Em Ewropayeke bê teror dixwazin



N: Eskender Ceiferî

Li Ewropayê bi giştî û bi taybetî jî li Ewropaya nav-endî û Skandînaviyê, raştgirî û nijadpêreştî berfireh bûye û vê mijarê jî derfet daye çalakvanên serbixwe, ku dengê xwe li dijî têrorê hildin. Ew vê têrora ku ji aliyê raştgir û nijadpêreştan ve bê kirin, dişubînin kiryarên dîktatoran.

Du salan beriya niha li bajarê Hanauê yê Almanyayê êrîşî ser hin welatîyên biyanî li wir hate kirin û têde 9 kesan jiyana xwe ji deşt dan.

Di salvegera êrîşê de, komeke çalakvanan, behsa êrîşê dikin û dibêjin, ew li dijî hemû çalakiyên têrorîstan li Ewropayê ne.

Di peyameke hevgirtî û hevpar a Tora Dijberên Raştgiriye li Sachsen-Anhaltê, Hevbendiya Bi qurbanî û Berketiyan re, koma naskirî bi Nabe Meydanê Bidin Tawanbaran û projeya radyoyî ya Dengê Civakê de ku bi helkefta yekemîn salvegera êrîşa li bajarê Hanauê hate belavkirin, tekez hate kirin ku ew Ewropayeke bê teror dixwazin.

Wan herwisa got ku emê bi van peyvan, xwe li tevahiya heval, dayîk û bav, xwîşk û bira û endamên malbatên kuştîyan girê didin û herwisa girêdana xwe bi hemû welatîyan re çê dikin. Hevbendiyê bi wan kesan re jî dikin ku bi awayekî raştê yan jî, ji dûr ve ketine ber êrîşa tund û nijadpêreştîyê ya salekê beriya niha li bajarê Hanauê.

Ew çalakvan ku bi slogana dijatiya teror li Ewropayê derketine holê, didin xuyakirin ku teror li Ewropayê, çî ji aliyê tundrew û raştgiran ve bê kirin yan jî ji aliyê kesên



ser bi dîktatorên welatên din ve, cîhanê raştî metirsiyeke mezin tîne ji ber ku Ewropa û bi taybet Ewropaya navendî, wek bingeheke xurt a jiyana hevpar û azadiyê tê dîtin.

Di beşeke din a peyama wan de hatiye: Em ji bo Ferhad Unvar, Hemze Kurtović, Seyîd Nisar Haşimî, wili Viorel Păun, Mercedes Kierpacz, Kaloyan Welkov, Fatih Saraçholo,, Sedat Gürbüz û Gökhan Gültekin bi tazî û serexweşî ne. Em bi hêz û piştevaniya xwe we dişînin Hanauê ku ji bo ku daxwaza bicîkirina wekhevîyê û zelalkirina mijarê bikin.

Ew herwisa di beşeke din jî daxuyaniya xwe de balê dikşînin ser wan êş û eleman ku qurbanî û malbatên wan, ji ber têrorê dibînin û didin xuyakirin ku eger teror kiryarêke nemirovane be, rêgirînekirin ji berfirehbûna têrorê jî, kiryarêke nemirovanetir e. Dîsa behsa bûyera Hanauê dikin û tekezê jî dikin ku em aliyê we digirin ji bo ku kuştîyan bi bîr bînin û di odeyeke vekirî de rêzê ji wan bigirin. Em piştrast in ku nikarin xema salekê beriya ya wan kesan heşt pê bikin ku endamên malbata xwe ji deşt dan. Lê belê em dixwazin ji we re bidin xuyakirin ku em di bîranînê de û bi ramanên xwe bi we re ne. Herwisa em dixwazin careke din tekezê bikin ku raştgirî, dijberiya cihûyan, dijberiya tevgerên jinan û herwisa kiryarên din ên nijadpêreştî û nemirovane ji holê nerabûne lê em ji bo dijatiya wan li vir in.

Vê girûpê, beriya niha jî bi helkefta standina biryara dadgeha Bêljîkê li dijî Esedula Esedî û sê têrorîstên din ên rejîma faşîstên Tehranê daxuyaniyek dabû û ragihandibû, ew dixwazin rê li ber çalakiyên têrorîstên Tehranê bê girtin. Pirsgerêka welatîyên Îranê ku li Ewropayê dijîn, pirsgerêka wan e jî. Ji ber ku ew li vir li Ewropayê kar dikim, bacê didin û mafê wan ê jiyananeke ewleh û xweş heye. Lê belê têrorîstên Îranî, jiyana hevpar û pirrengî a Ewropayê raştî metirsiyeke mezin aniy. Eger têrorîst bi karibin bi hezaran kîlomêtran derbas bikin û bi aramî û bê haydarbûna civaka Ewropayê karê xwe li vir bikin, wê demê qet xêra civakê ji azadî û dêmokrasîyê re namîne.

Ji Halle heya Hanauê, em dixwazin di hêz û acizbûnê de li piştê hev bin. Em rê nadin organên dewletê ku pirsgerêkan ji me re çê dikin û dixwazin me tepeser bikin, û yan jî ew kesên ku rojane kîn, torebûn, acizbûnê belav dikin, me aştengdar û felec bikin. Ev jî, wêrekiyê dide me ku em bizanin bi hizrên xwe û hewlên xwe tenê nîn in.

Ew girûp ku wek dijberên raştgiriye jî tê naskirin, bi silavên hevgirtîbûnê peyama xwe bi dawî tîne û dide xuyakirin em jî wek qurbaniyan û malbatên wan, mijarê li pêşberî dadgehgê gîlî dikin û dixwazin kiryar bikevin dewsa gotinan. Bi bîranîna bûyeran, civak ji bo zelakirina mijarê, û xuyabûna enca-ma dadgehê, tevî çalakiyeke dêmokrasîxwazîyê dibe.

Qedera Kurdan




N: Ebdulazîz Qasim

Hemû dizanin ku nakokî û herwiha hevpeymanî yan rêk-kevtin di navbera dewletan de li ser binyatê berjewendiyên ava dibin, û wekî dizanin ku îro devera Rojhilata Navîn di nava çend qeyran û krîzên mezin de derbas dibe û bi taybetî qedera milletê Kurd ber bi çarenivîseke nediyar ve diçe.

Îro ji ber heman rewşa Rojhilata Navîn ji aliyekê ve û ji aliyê din ve ji ber zêdebûna destêverdana Tirkîyê û Îranê, em dibînin ku dewletên Erebi sînoran ji bo berjewendiyên xwe danayin û niha yek bi yek digel Îsraîlê rêkvevtina îmza dikin, dibe ku heta hikûmeta Sûriyê jî bigihêje rêkvevtinekê digel Îsraîlê, û herwiha ji ber gaz û petrola deriya Sipî dibe rêkvevtin û girêbestin mezin û stratîjîk di navbera Misr, Yûnaniştan û Îsraîlê de bîne îmzekirin.

Ji daxuyaniyên dewleta Tirkîyê xuya dibe ku Tirkîya dixwaze xwe nêzîkî Îsraîl û Ewropa û Erebiştana Siûdiyê bike, lê xuya ye ku wê cihê Tirkîyê nabe di nav van rêkvevtin û hevpeymaniyên nû de, herwiha ku gelek ji van rêkvevtinan wê li ser binyatê kêmkirina destêdirêjî û destêverdana Tirkîyê û Îranê bîne avakirin, lewra bi baweriya min divê Kurd cihê xwe di çarçoveya van hevpeymaniyên nû de bigire, nemaze ku Tirkîya û Îran tede nînin.

Her parçek ji Kurdiştanê divê bizane ku Tirk û Firs û Erebi nabin dost, lewra pêdiviye her partiyeke Kurdî li ser vê binyatê siyaseta xwe ava bike ji ber dijminê bira nabe dostê mirov, herwiha erkê herî mezin dikeve li ser şuyê



Herêma Kurdiştanê û herwiha bi baweriya min divê hikûmeta Herêmê têkiliyên xwe bi taybetî yên aborî û siyasî digel Tehran û Enqerê kêmkirine û dubare siyaseta xwe digel Bexdayê bin-erxîne û biryara rêfrandomê bi zûtirîn dem bicih bîne.

Piştî dagîrkirina Kerkûk, Şingal, Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê, îro Hewlêr raasteraşt ji çar aliyan ve raştî êrîşên dagîrkeran dibe, Bexda bi dorpêça aborî û mûçebirînê, Tehran bi gefên milîsên xwe û mûşekbarandinê, û Enqera bi dagîrkirina axa Kurdiştanê bi hênceta PKKê, tevî hewldanên PKK bo lawazkirina Herêma Kurdiştanê.

Pêdivî ye Kurd bi wêrekî li ser rewşa xwe rawestînin, ji bo yekrêziya gelê Kurd bixebtin û bédeng nemînin li hember siyasetên PKKê yên dijî destkeftên netewî û herwiha pêdivî ye Kurd destê berdînan ji siyasetên biratiya gelan û biratiya digel Erebi û Firs û Tirkan ku ti nanî nadin û xewin û xeyal in bi tenê di mejiyê siyasetmadarên Kurdan de tene xwedankirin.

Bizava Kurdî hemû hewldanên dostaniyê ceribandînin, digel Rûs, Amerîkî û Ewropîyan, lê ev hewldan man di çarçoveyên teng de, û hemû qurbanîyên milletê Kurd û qehremaniya pêşmerge ya li dijeterorê û têkşikandina rêxistina DAÎŞa terorîst nekarî rêbigire li dizîna xelata qehremaniya pêşmerge ji aliyê rejîma terorîst ya Tehranê bi wê sînariyo derewîn.

Belê, milletê Kurd li ber man û nemanê ye, qedera Kurdan wiha ye, îro, sibe, dusibê ... divê milletê Kurd li her çar parçên Kurdiştanê û li diyasporan bikevin di şerê man û nemanê de, ji bo vê yekê pêdiviya me bi yekrêziyê û bi naskirina dost û dijminê heye û bi tenê bi vê yekê em ê bibin xwediyê xelata herî hêja (Kurdiştan yan neman).



Bi sedema teqîna mînê welatiyekî Kurd canê xwe ji dest da



Roja Înê 24ê Rêbendanê, welatiyekî Kurd yê bi navê “Nadir Birariyan” temen 45 salî û xelkê gundê “Kelkel” ê ser bi Asimaveya Çirdawil, bi sedema teqîna yek ji mînên bi cih mayî yên şerê Îran û Îraqê, li bajarê Mêhranê canê xwe ji dest da.

Ew welatiye li navçeya “Mîmk (binkeya Helaleya bakûr)” ya ser bi bajarê Mêhranê raştî wê bûyerê hat.

Herwisa, roja Yekşemî 12ê Rêbendanê, welatiyekî Kurd yê bi navê “Saman Rezayî” li nêzik gundê “Miledizge” ya ser bi bajarê Serpêzelawê, bi sedema teqîna mînê bi giranî birîndar bû û lingek xwe ji dest da.

Ew welatiyê Kurd li dema çêrandina Pezê xwe bi sedema teqîna mînên bi cih mayî yên serdemê şerê Îran û Îraqê, raştî wê bûyerê hatibû.

Kombûnên nerizayetiye di piraniya bajarên Îren û Kurdistanê de berdewam in

Li zaf bajarên Îran û Rojhilatê Kurdistanê, qatên cuda ji xelkê bi kombûn û nîşandana nerizayetiya xwe bona bideştveanîna mafên xwe, bêzariya xwe nîşan dan.

Roja Yekşemiyê 14ê Şibatê, sedan kes ji malnişînên bajarê Sinê hevdem digel nerizayetiya malnişînên seranserî yên Îranê, kombûna nerizayetiye lidar xistin û daxwaza mafê xwe kirin ku rejîmê bi temamî ew jî, her wekî aliyên din yên civatgehê piştguh xistîne.

Malnişînên bajarê Sinê ber

deriyê Saziya dabînkirina Civakî kom bûn û li ser rewşa xirab a jiyana xwe, nedana mîaş û zemana zêrevaniya pizişkî û derman, nerizayeti dane kivşê.

Hevdem digel nerizayeti û kombûna malnişînên bajarê Sinê, di piraniya parêzgeh û bajarên Îranê de jî malnişînan kombûnên nerizayetiye lidar xistibûn, bo minak em dikarin amajê bi kombûna nerizayetiya malnişînên îdara Balafirvaniya Îranê di Tehranê û malnişînên Tewrêz, Meşhed, û zaf cihên dinê bikin.



Di rewşa xirab a aborî û giraniya bazarê û kêmiya mîaş û nebûna kar bona peydakirina bijîva jiyana rojane, rejîm jî bi çendîn mehan carekê mîaşê malnişînan dide, wê yekê jî jiyana wan dijwar kiriye.

Kedkarên şaredariya Bîcarê 3 meh e ku mûçeyên xwe wernegirtine

Kedkarên Şaredariya Bîcarê, bi sedema wernegirtina mûçeyê 3 mehan û herwisa wernegirtina pereyê 10 mehên zêdekariyê, heyama sê roje ku ber derê bînaya şêwraya wî bajarî kom dibin û dest ji xirkirina ziblên wî bajarî kêşandine û nerizayetiya xwe nîşan dan.

Kedkarên Şaredariya Bîcarê

li roja Şemî 25ê Rêbendanê, bi sedema paşkevtina mûçeyê sê mehan û herwisa wernegirtina pereyê 10 mehên zêdekarî, dest ji karkirine kêşane û li ber deriyê bînaya şêwraya wî bajarî man girtine.

Yek ji kedkarên Şaredariyê ragihandiye: “Çend car e me serdana berpîrsên şaredariya

bajarê Bîcarê kiriye, çiqas em nerizayetiye ji xwe nîşan didin, dengê me nagihîje çi cihekê û em jî mirov in û me jî mafê jiyanê heye, sê meh e me mûçe wernegirtiye û 10 meh e me perê zêdekariya xwe wernegirtiye, bi vî awayî berpîrs derheq me kêmîrxem in, û em mehkûm jînavçûnê ne.



Ceco Xan serkirdeyê qehriman ê tevgera azadîxwaziya Kurdên Xurasanê



N: Keyhan Mihemedîniyad

Şerê Çaldiranê ku bi şerê împitartoriya Osmaniyan û Sewewiyan tê nasîn, ew şere di sala 1514an de di navbera Osmaniyan û Sewewiyan qewimî.

Piştî wî şerî gelek alogor bi ser Kurdiştanê de hatin û Kurdiştan dibe bi du parçe bi ser Sewewiyan û Osmaniyan de. Wê demê alogorek din jî ku pêkahat ev jî dîrxistina Kurdên bakurê Rojhilatê Kurdiştanê bû ku di navbera salên 1598an û 1602'an de Şah Ebas destûrek da ku Kurdên vê deverê bo aliyê Xurasanê ve bêne dîrxistin. Piştî împiratoriya Sewewiyan û hatina çendîn hikimdarên din di Îranê de û di encamê de hatina Qacaran bo ser desthilatê, wê demê dîsan wan dest avêtin bi serkutkirina Kurdan û nemaze Kurdên Xurasanê.

Lê malbatek jî hebû ku di Xurasanê de li dijî wan bisekîne û ev jî malbata Elah-wirdî Begê bavê Ceco Xan bû. Ceco Xan Deregezî yek ji mezintirîn û netiristirîn Kurdê devera Xurasanê bû. Ev di gundê "Hisar" ê ser bi bajarê deregezê de hatiye dinê. Bavê Ceco Xan ê bi navê Elahwirdî Beg dema ku wekî hakimê devera Miyankohê tê diyarîkirin, wê demê Ceco Xan jî digel bavê xwe diçine wê devrê û li gundê "Kebikan" û devera Miyankohê dimînin.

Ceco Xan kesek siyasetmedar, rewşenbîr û zana bû. Her lewma bavê Ceco Xan ew wekî piştevanê xwe dizanî û hertim bi wî re bû. Ceco Xan li kêleka bavê xwe wekî çiyayekê piştevanî ji desthilata wî dikir.

Dema ku bavê Ceco Xan diçe ser dilovaniya Xwedê, Ceco Xan cihê bavê xwe digre û dibe birêveberê wê deverê. Ceco piştî mirina bavê xwe birêveberekî baş bû û xelkê wê deverê jê razî bûn. Ceco Xan dixwest tev derên Xurasanê bixe bin desthilata xwe û Kurdan ji bin destê dagîrkeran rizgar bike. Her lewma desthilta Qaçaran li dijî vê biryara Ceco Xan bû û hertimî givaş dixiste ser xelkê devera Xurasanê. Rojek li rojan di devera Xurasanê de, dengê qîrîna zarokan û jinan û nalîneke kûr li wê deverê tê bihîstin, axîn û nalîn û qîrîna zarok û jinan di wan çiyayan de çend car deng dide, ew denge yê hawara hevkarîyê ye, ew gazî Ceco dikin. Ceco Xan bi bihîstina qîrînan, xwîna wî xirab dibe û xwe diavêje ser piştî hespê xwe û çend çek-daran jî digel xwe dibe. Dema ku Ceco ji dûr ve mêzeyê gundan dike, dokelek bilind dibe, kadîn û gidişên ku xelkê bo ajelên xwe embar kiribûn tev dihatine şewitandin.

Dema ku Ceco digîje wê deverê tenê gundên şewitî û qirkirinekê dibîne. Ev komkujî û wêrankariye dujminê hertimî yê gelê Kurd kiribû ew gundane ji aliyê leşkerê Qajaran û Êrisan ve hatibû şewitandin. Ceco Xan nedikarî wê qirkirinekê qebûl bike. Ji aliyek din ve jî bi heman awayê Rûsan jî destdirêjî dikirine ser wan deveran û ew serkut dikirin, vê yekê dengvedanek zêde li pey xwe ve anîbû. Dijayetiya Ceco bi dijî Qajaran û Êrisan roj bi rojê zêdetir dibû û xwe amade dikir bo vê ku li dijî serkutkariyê bisekîne û xelkê xwe li bin zilm û serkutê de rizgar bike. Wî di demek kin de leşkerê xwe amade kir.

Wî digel sê birayên xwe, Îso Xan, Elo Xan û Memo Xan û hejmarek din ji şervanên qehriman serhildana xwe dest pêkir. Wî bi êrîşkirin li ser binkeyên dujmin di wê deverê de bi awayekî qehrimanane karî wê deverê heta



Deregezê rizgar bike û sedan serbazê dujmin bikuje. Bi wî awayî navê Ceco Xan bibû peyva ser zarê xelkê Deregez û gundên derdorê wî bajarî û xelkeke zêde tevî leşkerên Ceco Xan bûn. Mensûrûl Mulk ku yek ji fermendê Qacaran bû û ji aliyê hêzên Ceco Xan ve hatibû derxiştin, car din bi leşkerekê çend hezar kesî ve êrîş kire ser desthilatdariya Ceco Xan, lê dîsan ew û hêzên wî ji aliyê hêzên Ceco Xan ve raştî şikestê hatin.

Ceco Xan desthiladariya xwe berfireh kir û heta Qoçanê xiste jêr desthilatdariya xwe, ev yeka bo hikûmeta navendî cihê qebûlkirinê nebû û daxwaza alîkariyê ji Êrisan kir. Êrisan çend leşker û hêzên siwar bo alîkariya hêzên Qacaran şandin û wê carê, dîba Ceco Xan hevdem digel hêzên Êrisan û Qacaran şer bikiriba.

Merema Ceco Xan rizgarkirina deverên Xurasanê di bin destê dujminan de bû û dixwaşt li wir hikûmetek serbixwe a Kurdî ava bike û nehêle Kurdên Xurasanê bêne serkutkirin. Hêzên Êrisan û Qacaran çend caran êrîşê ser desthilatdariya Ceco Xan kirin, lê hertim ev raştî şikestan dihatin.

Ceco Xan bibû xewnek bo dujminan, Êrisan bo binçavkirina Ceco Xan xelat diyarî kirin. Hêzên Ceco Xan roj bi rojê bihêztir dibûn û hêzên partîzen û şervan di çiya û deşt, gund û bajarên devera Xurasanê de berbilav bibûn. Xelkê wan deveran bi hebûna hêzên Ceco Xan razî bûn û roj bi rojê xortên nîştimanperwer tevî hêzên Ceco dibûn ku bikarin berevaniyê ji ax û namûsa netewa xwe bikin.

Êrisan û Qacaran xwe bihêztir kirin û dîsan êrîşê ser hêzên Ceco Xan kirin. Wê carê şerek mezin di derên Deregezê de qewimî, şerek ku hin çavkanî dibêjin sê mehan pê çû. Ceco Xanê qehriman ji bo ku bikare xelkê vê deverê jiyanekê xweş û azad hebin ya ku hewce ba dikir û li dijî dagîrkeran disekinî. Di wî şerî de gelek hêzên Ceco Xan ji aliyê hêzên Êris û Qacaran ve hatine kuştin û Ceco Xan digel hêzên xwe kevtine dorpêça Êrisan û ti rêyek nemabû ku xwe û xelkê xwe jê rizgar bike. Di encamê de û di nav şer de dema ku Ceco Xan di nav gundekî de mijûlê şer bû pêyê hespê wî dikeve nava qûbiya heriyê de û Ceco Xan bi gulleyê hêzên dagîrker ve tê şehîdkirin.

Ceco Xan di sala 1911'an de ji aliyê hêzên Êris û Qacaran ve hate şehîdkirin. Êrisan cenazê Ceco Xan di Qoçanê de pir kirin ji berf û bûz û ber bi Moskokeyê ve birin ku Tizarê Êrisan wî serkirdeyê Kurd bibîne. Hin çavkanî jî dibêjin Tizarê Êrisan serê Ceco Xan dibire û di kiloxê serê Ceco Xan de şerabê vedixwe.

Ceco Xan digel malbata xwe û xelkê Kurd ên devera Xurasanê, bi salan di nav sir û seqemê, baran û sir, deşt û neval û çiyayên Xurasanê de bi rijîndina xwîna hezaran xortên Kurd li hember dagîrkeran sekinîn û xebat kir. Îro rojê jî navê wan navdaran di devera Xurasanê û Kurdiştanê de hertimî li ser zarê Kurdan e û ti carî wî ji birnakin. Niha di Xurasanê de gelek awaz û stran û helbest li ser Ceco Xan û qehrimanetiya wî hatine afirandin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Esrîn Mihemedî bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmîyê hate veguhaştin

Îro Sêşemî 28ê Rêbendanê, Esrîn Mihemedî piştî bi dawîhatina heyama lêkolîna wê ji girtîgeha El-Mehdî ya ser bi bajarê Urmîyê bo girtîgeha navendî a wî bajarî hate veguhaştin.

Ew welatiya Kurd roja Şemî 20ê Befranbarê ji aliyê hêzên ewlehî yên girêdayê Îtîla`ata Spahê ve li bajarê Tehranê hatibû binçavkirin û navbirî li peywendiyêke telefonî digel malbata xwe ragihandibû ku bo lêkolînê bo girtîgeha Îtîla`ata Spahê li bajarê Urmîyê hatiye veguhaştin.

Esrîn Mihemedî xelka bajarê Sineyê û xwendekara rîşteya endazyariyê ye.

Heya niha ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wê welatiya Kurd de hatiye sepandin ti zaniyariyek ji ber deşt nîne.

Husên Hesexanî ji aliyê dadgeha Înqilaba Mihabadê ve hate cezadan

Husên Hesexanî, mamosteyê malnişînkirî û endamê mekteba qurana Kurdistanê, bi tohmata “piropagende li dijî nizam”ê ji aliyê taya 1 a dadgeha Înqilaba Mihabadê ve bi 3 meh girtingeh hate cezadan.

Ew welatiye bi piştgirêdan bi maddeya 500 a yasaya cezayên Îslamî û bi hikma dadwer “Cewad Xulamî” serokê taya 1 a dadgeha Îqlîaba Mihabdê, bi 3 meh girtingeh hate cezadan.

Şêwreya Hevahengî ya Saziya Sênfên Çandî, tevî şermezarkirina reftarên wiha, daxwaza dawîpêanîna hêzên ewlehî bi serkutkirina mamosteyan kiriye.

Husên Hesexanî roja Çarşemî 1ê Gelawêja îsal, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate girtin û piştî binçavkirinê bo girtingeha îdareya Îtîlaata Mihabadê hate veguhaştin.

5 welatiyên Kurd bo girtîgeha bajarê Urmîyê hatine veguhaştin

Roja Şemî 25ê Rêbendanê, sê welatiyên Kurd yên bi navên “Husên Gerdişî, Şepol Xizrî û Ferhad Mûsapûr”, piştî bi dawîhatina heyama lêkolînê ji girtîgeha Îtîlaata Spahê li bajarê Urmîyê, bo benda girti-yên siyasî yên girtîgeha wî bajarî hatine veguhaştin.

Herwisa roja Şemî 21ê Rêbendanê, du welatiyên din yên bi navên “Soran Husênzade û Sîrwan Nûrî”, piştî bi dawîhatina heyama lêkolînê ji girtîgeha Îtîlaata Spahê li bajarê Urmîyê, bo benda qerentîne ya girtîgeha wî bajarî hatine veguhaştin.

Roja Şemî 20ê Befranbarê, Şepol Xizrî û Sîrwan Nûrî, hewdem digel binçavkirina sê welatiyên din yên bi navên “Salar Rehewî, Deriya Talibanî û Efşîn Mamehmedî”, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî ji aliyê hêzên ewlehî yên hikûmeta Îranê ve li bajarê Mihabadê, hatibûne binçavkirin.

Herwisa roja Şemî 20ê Befranbarê, Soran Husênzade ku karê Şanoyê dike, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve li bajarê Mihabadê, hatibû binçavkirin.

Hewdem digel binçavkirina wan welatiyan li bajarê Mihabadê, roja Şemî 20ê Befranbarê, Ferhad Mûsapûr digel birayê xwe yê bi navê “Fireydûn Mûsapûr û Behmen Yûsifzade” li bajarl Rebetê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Ferhad Mûsapûr, mamostayê zimanê Îngilîsî li fêrgeha zimanê Îngilîsî ya “Rêzman” e.

Roja Şemî 22ê Befranbarê, Husên Gerdişî xelkê bajarê Bokanê, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Kolberekî Kurd bi sedema kevtin ji bilindahiyên “Tete”yê ve canê xwe ji deşt da

Şeva Çarşemî 22`ê Rêbendanê, kolberekî Kurd yê bi navê “Aram Caten” xelkê gundê “Kanîsanen” yê ser bi bajarê Merîwanê bi sedema kevtin ji bilindahiyên “Tete”ya Hewramanê ve canê xew ji deşt da.

Ew kolberê Kurd di dema kolberiyê de raştî vê bûyerê hatibû û termê wî ji bo bajarê Merîwanê hate veguhaştin.

21 February international mother language day



21`ê Şibatê roja cîhanî ya Zimanê Dayîkê

